Navenda Tomarê ya Neuköllnê

Hûn rastî şiklekî cudageriyê (dîskrîmînasyonê) hatin an jî bûn şahidê cudageriyekê?

Em hemû cure û şiklên cudageriyê tomar dikin:

- Zayendperestî
- Nijadperestî
- Dijberiya Romanan
- Dijberiya Cihûtiyê
- Dijberiya Misilmantiyê
- Rastperestî
- Homofobî û Transfobî

Ji kerema xwe serpêhatiyên xwe an jî çavderiyên xwe bi me re parve bikin.

Li gorî daxwazê, em bi van zimanan şêwirmendî û xizmetê didin:

Almanî, Kurdî, Erebî, Tirkî û Îngilîzî

Demên Xebatê

Rojên Duşemê ji 15'an heta 18'an
Rojên Pêncşemê ji 10'an heta 13'ê

Têkilî

Navenda Tomarê ya Neuköllnê
Navnîşan: Richardstr. 102. 12043 Berlin
Telefona destî: 0157 39285358
E-mail: register-nk@yekmal.de
Malper: www.yekmal.de/registernk
Forma **online ji bo serlêdanê**:
www.yekmal.de/vorfaellemelden
Twitter: @NkRegister

Saziya Berpirsiyar:
Yekmal e.V.
Schönleinstr. 23, 10967 Berlin
www.yekmal.de
www.facebook.com/yekmal.de

Navenda Tomarê ya Berlinê:
Malper: https://www.berliner-register.de/
E-Mail: info@berliner-register.de
Telefon: 01520-442 574 6
Navnişan: Berliner Register, Sewanstr. 178, 10319 Berlin
Twitter: @RegisterBerlin

AnDi-Berliner Anti-Diskriminierungs-App
https://www.berlin.de/sen/lads/beratung/diskriminierung/andi/

Piştgirî

Ev proje ji aliyê bernameya hikûmeta Berlînê ya bi navê "Demokrasî. Pirrengî. Rêzgirtin. Li dijî tundiya rastgir, nijadperestî û antîsemîtîzmê" ya Wezareta Dad, Parastina Xeridar û Dijî Cudageriyê ya Senatoyê tê piştgirîkirin.

Gefördert durch BERLIN Senatsverwaltung für Justiz, Verbraucherschutz und Antidiskriminierung
im Rahmen von DEMOKRATIE. VIELFALT. RESPEKT. Das Landesprogramm gegen Rechtsextremismus, Rassismus und Antisemitismus
Landesstelle für Gleichbehandlung – gegen Diskriminierung

CiD -Navenda Pirrengiya Înterseksiyonel

Yekmal e.V.

Register Neukölln

Navenda Tomarê ya Neuköllnê

Register Neukölln

Ji Mijdara 2021'an şûnda, Navenda Pirrengiya Înterseksiyonal a Yekmal e.V. rêveberiya Navenda Tomarê ya Neuköllnê digire. Navenda Tomarê ya Neuköllnê bûyerên nijadperestî, dijberiya cihûtiyê, dijberiya misilmantiyê, dijberiya LGBTI*Q, dijberiya romanan, rastgirên tundî û cudageriyên din ên ku li navçeya Berlînê ya Neuköllnê diqewimin, tomar dike.

Hün dikarin van bûyeran bi navendên berpirsiyar yên navçeyê re ragihînin û selêdan bi vê şiklî ji ofîsên koordînasyona giştî ya tomarkirinê re tên şandin. Ew serlêdan tên berhevkirin, nirxandin û weşandin.

Lê belê, armanca Navenda Tomarê ya Neuköllnê ne tenê ew e ku bûyerên cudagerî yên bingehîn an jî rojane yên li Neuköllnê pêk tên belge bike û analîza wan bike. Her wiha Navenda Tomarê ya Neuköllnê dixwaze xebatên bilindkirina hişmendiyê li ser cudageriyê bilind bike di nav civatê de.

Hûn dikarin serpêhatiyên cudageriyê an jî çavderiyên cudageriyê di dema şêwirmendiyê de, bi forma online ya li ser malpera me, an jî bi şandina nameyek nivîskî bi me re parve bikin.

Şêwirmendiya me niha hêj jî li ser hevpeyivîna destpêkê û şandina dezgehekê eleqedar e. Şêwirmendiya me hefteyê du rojan pêk tê û li gorî daxwazê dikare bi zimanên li jêr hatine nivîsandin were pêşkêşkirin.

Li gorî daxwazê, em bi van zimanan şêwirmendî û xizmetê didin:

Almanî, Kurdî, Erebî, Tirkî û Îngilîzî

Demên Xebatê

Rojên Duşemê ji 15'an heta 18'an
Rojên Pêncşemê ji 10'an heta 13'ê

SAZIYA BERPIRSIYAR

YEKMAL e.V. xwe weke rêxistineke xweser a koçberan dibîne û weke rêxistineke nesiyasî û dermezhebî, pabendê mafên mirovan û prensîba wekheviyê, rêxistineke nedewletî û li dijî her cure cudagerî û nijadperestiyê dibîne.

CiD -Navenda Pirrengiya Înterseksiyonel

CiD -Navenda Pirrengiya Înterseksiyonel beşa dij-cudageriyê ya komeleya malbatên Kurd e.

Ji xeynî xebatên curbecur, 3 mijarên sereke yên vê beşê hene:

Tomarkirin/Şopandina Cudageriyê

Em dixwazin tu cure û şiklên cudageriyê di tariyê de nemîne û cudagerî di qada giştî de were dîtin û nîqaşkirin.

Gav û Pengavên Hêzdarkirinê ji bo Kesên Rastî Cudageriyê Hatine

Em dixwazin ji bo kes, malbat û zarokên ku rastî cudageriyê hatine bernameyên hêzdarkirinê amade bikin û piştgiriya wan bikin.

Perwerdehî ji bo Kesên Xebatan Berfireh Dikin

Em dixwazin xebatên pisporiyê û perwerdehiyê pêşkêş bikin ji bo wan kes û dezgehên ku xebatên eleqedar di qada giştî de berfireh dikin.